
# Ekola Aqtepeyê ya Edebiyatê û hizra Kurdîtî-Elewîtî-Neqşebendîtiyê

Abdurrahman Adak

Ekola Aqtepeyê jî, bizaveke edebî ye ku bi prensîbên xwe yên xweser ên wekî Kurdîtî, Elewîtî û Neqşebendîtiyê di tarîxa edebiyata Kurdî de bûye xwediyê cihekî taybet û bi vî awayî û di nav nûnerên helbesta Kurdî ya klasîk de derketiye pêş...

Bi awayekî giştî ekolek, komek e ku hemû endamên wê bi hin taybetiyên xwe yên xweser ji kesên dî yên ku di xalên giştî de bi wan re hevbeş in vediqetin. Ekola Aqtepeyê jî, bizaveke edebî ye ku bi prensîbên xwe yên xweser ên wekî Kurdîtî, Elewîtî û Neqşebendîtiyê di tarîxa edebiyata Kurdî de bûye xwediyê cihekî taybet û bi vî awayî û di nav nûnerên helbesta Kurdî ya klasîk de derketiye pêş. Di avahiya vê ekolê de xaleke gelekî taybet heye ku nimûneyên wê di tarîxa edebiyata Kurdî de nehatine dîtin û belkî dê qet neyên dîtin jî. Lewra hemû endamên ekola Aqtepeyê endamên heman malbatê ne ku ev malbat jî wekî Malbata Aqtepeyê tê naskirin. Bi gotineke dîtir, endamên vê ekolê ne di warê hizrî tenê de, herweha di warê irsî de jî di nav yekîtiyekê de ne. Ev yek di tarîxa sazbûna ekolan de tiştekî awarte ye û guman tuneye ku di avabûna hizreke hevbeş de, di nav endamên vê ekolê de rola vê yekê jî gelek e.

Ekola Aqtepeyê di dabeşkirina serdemên edebî de dikeve serdema piştî mîrektiyan û di dawiya sedsala XIXem û destpêka sedsala XXem de hebûna xwe domandiye ku ev mawe beramberî dawiya Osmaniyan û destpêka Komara Tirkiyeyê tê. Ji aliyê cihê ekolê ve rewşeke awarte heye. Lewra ekol, ne li bajarekî, li gundekî bi navê Aqtepeyê ava bûye. Ev gund îro li Kurdistana Bakur li wîlayeta Diyarbekirê li ser qezaya Çinarê ye. Ji ber ku tevahiya endamên vê ekolê ji vî gundî ne û bi nisbeya "Aqtepî" tên naskirin, bi awayekî siruştî ekol jî dibe "Ekola Aqtepeyê". Ji ber ku edebiyata Kurdî ya klasîk bi piranî di serdema mîrektiyan de û li bajaran derketiye meydanê, avabûna ekoleke edebî di serdema piştî mîrektiyan de û li gundekî, wekî paradoksekê xuya dike û zêde nayê fêmkirin. Eger bi kurtî em bersiva vê yekê bidin, divê bê gotin ku avabûna vê ekolê rasterast bi hebûna medrese û dergahê wî gundî ve girêdayî ye ku li jêrê ev yek dê bê zelalkirin.




### Paşxana Ekola Aqtepeyê: Malbat, Medrese û Dergahê Aqtepeyê

Ji îzahê wareste ye ku rawestana li ser hûrgiliyên binerih û şaxên Malbata Aqtepeyê ne armanca vê nivîsê ye. Di çarçoveya mijarê de, em ji Malbata Aqtepeyê zarok û neviyên Şêx Hesenê Nûranî (k.d. 1863) yên ku nûnerên edebiyata Kurdî ya klasîk in fêm dikin. Ev yek di şemaya li kêlekê de jî dikare bê şopandin.

Çawa ku tê dîtin herdu kurên Şêx Hesenê



Şêx Eskerî

Nûranî Şêx Ebdurehman û Şêx Mihemed Can, herdu kurên Şêx Ebdurehman Şêx Kerbelayî û Şêx Eskerî û kurê Şêx Mihemed Can Şêx Hesîb endamên heman malbatê ne û herweha endamên Ekola Aqtepeyê ne jî. Vê malbatê di serdema piştî mîrektiyan de bi yekpareyî û di asteke bilind de nûnertiya edebiyata Kurdî kirine. Endamên wê hemû mehsûlên medrese û dergahê Aqtepeyê ne ku ji aliyê serokê malbatê Şêx Hesenê Nûranî ve hatine damezirandin. Guman tuneye di derketina vê ekola edebî de rola sereke ya vê medreseyê û herweha ya vî dergahî ye.

Divê neyê jibîrkirin ku di serdema piştî mîrektiyan de terîqeta Neqşebendîtiya Xalidî bi rêberiya Mewlana Xalidê Şarezorî (k.d.1826) valahiya mîrektiyên Kurdan tijî kiriye û hemû medrese û dergahên ku bi vê terîqetê ve girêdayî, bûne cihên geşepêdana edebiyata Kurdî ya klasîk ku Medrese û Dergahê Aqtepeyê ji bo vê yekê nimûneyeke girîng e. Damezirînerê van herdu saziyan Şêx Hesenê Nûranî, wekî xelîfe/nûnerê Şêx Salihê Sîpkî (k.d.1852) ku li gundekî Şirnexê bi navê Basretê postnişîniya Dergahê Basretê dikir, hatiye Aqtepeyê û li wir ev medrese û dergah ava kirine.[1] Dergahê Basretê jî, di wê serdemê de yek ji du dergahên herî zêde girîng ê Neqşebendîtiyê bû ku yê duyem jî Nehrî ye. Di Kurdistana wê serdemê de Neqşebendîtî di serdema xwe ya zêrîn de bû û li gorî qeneeta me ew cara yekem bû ku tesewif li nav Kurdan bi awayekî sîstematîk û bihêz belav bûbû. Ji ber vê yekê jî di dergahên Neqşebendiyan de hestyarî û coş di asteke gelekî bilind de bû. Guman tuneye ku di vê atmosferê de eger qabiliyet û şiyana şexsî jî hebe, dahênana edebî jî dibe destkefteke jênger ku Ekola Aqtepeyê wekî nimûneya herî zêde girîng a vê yekê derdikeve pêş. Çawa ku ji beyta Şêx Hesîbê Aqtepî ya bi şêweya "Ya Îlahî Aqtepa me Ciz're û Şîraz ke" jî tê fêmkirin, endamên Ekola Aqtepeyê di nav wê hewldanê de bûn ku navê Aqtepeyê li kêleka bajarên Cizîra Botan û Şîrazê bidin nivîsandin. Guman tuneye ku çiqas perspektîf fireh be, dê ewqasî encameke baş bê bidestxistin û ev ekola edebiyatê bi vê perspktîfê derketiye meydanê.

### Berhemdariya Ekola Aqtepeyê

Bi şêweyeke bêhemta, hemû edîbên Malbata Aqtepeyê, di çarçoveya edebiyata Kurdî ya klasîk de xwediyên berhemên girîng û orjînal in ku ev yek di lîsteya jêrîn de dikare bê şopandin.

---

1 Malbata Şêx Hesenê Nûranî ku bi eslê xwe ji herêma Hekariyê ne, ji wir koçî Hawêl/Baykanê kirine û ew bixwe li wê derê hatiye dinyayê û li cem kesên wekî Mela Xelîlê Sêrtî û Şêx Salihê Sîpkî perwerde dîtiye û ji aliyê tesewifî ve bûye xelîfeyê Sîpkî. Piştre, li ser daxwaza şêxê wî, Siltan Ebdulmecîdê Osmanî bi mebesta avakirina medreseyekê li gundê Aqtepeyê 52 parsel erd daye wî û wî jî di derdora 1850yî de li wê derê Medrese û dergahê Aqtepeyê ava kirine. Ev herdu sazî ji wê tarîxê heta bi bûyera Şêx Seîdê Palo (1925) bi awayekî aktîf di warê ilm û me'rîfetê de xizmeta herêmê kirine. Lêbelê piştî têkçûna bûyerê endamên Malbata Aqtepeyê ji bêgavî belawela bûne û medrese û tekya jî hatine girtin. Derheqê malbatê de bnr. Tehsîn Îbrahîm Doskî, "Şêx Hesenê Nûranî û Hindek Navdarên Binemala Wî", *Vehînoka Rewdu'n Neîm, (berhevkirin:* Tehsîn Îbrahîm Doskî), Weşanxaneya Spîrêz, Dihok 2011, r. 11-18; M.Şefik Korkusuz, *Tezkire-i Meşayih-i Amid*, c.I-II, Kent Yayınları, İstanbul, 2004, r. 250-251; Murat Özaydın, *Şeyh Abdurrahman Aktepe: Hayatı, Eserleri ve Görüşleri*, Cihan Yayınları, İstanbul 2009, r. .93-100; Ramazan Pertev, *Mîrsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan) Ferhenga Menzûm a Kurdî-Farisî (Vekolîn-Tekst)*, Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî, Mêrdîn 2012, r. 14-16.; Dirbas Mistefa Silêman, *Serhildan û Werara Cûrên Nû yên Edebî di Kirmanciya Jûrî da (1850-1925)*, Weş. Wezareta Rewşenbîrî û Lawan Rêveberiya Çap û Belavkirinê, Dihok 2012, r. 233-271.

1. Şêx Ebdurehmanê Aqtepî (k.d.1907): *Dîwan û Rewdu'n Neîm*
2. Şêx Mihemed Can (k.d.1909): *Leyla û Mecnûn, helbestên curbicur*
3. Şêx Mihemed Kerbelayî (k.d.1939): *Dîwan, Mirsadu'l-Etfal (Şahrahê Kûdekan)*
4. Şex Mihemed Eskerî (k.d.1952): *Iqdê Durfam, Keşkol*
5. Şêx Hesîb (k.d.1947): *Dîwan*

Çawa ku tê dîtin ji aliyê pênc helbestvanên Aqtepî ve bi giştî heşt berhem hatine nivîsîn. Bi şertê ku em agahiyên bîbliyografîk deynin aliyekî, da ku mijar dirêj nebe, em dikarin dikarin van berheman bi kurtî weha bidin naskirin: Du heb ji wan dîwanên klasîk in (dîwanên Şêx Ebdurehman û Şêx Kerbelayî) û herdu jî di asteke bilind a edebî de hatine nivîsîn. Her şeş berhemên dîtir, di mijarên curbicur de hatine nivîsîn ku di tarîxa edebiyata Kurdî de di warên xwe de yekemîn in. Ji van berheman *Rewdu'n Neîm*a Şêx Ebdurehman, derheqê şemail û mi'raca Cenabê Pêxember de ye. *Leyla û Mecnûn*a Şêx Mihemed Can, yek ji girîngtirîn Leyla û Mecnûnên Kurdî ye. *Mirsadu'l-Etfal*a Şêx Mihemed Kerbelayî ferhengeke menzûm a Kurdî-Farisî ye. *Iqdê Durfam*a Şêx Eskerî ji çîrokeke Kurdî ya folklorîk pêk tê. *Keşkûl*a Şêx Eskerî jî berhemek e ku bi piranî ji helbestên wî yên ku bi şêweyên curbicur nivîsîne pêk tê û ji bo keşkûlên Kurdî nimûneyeke girîng e.

**Ekola Aqtepeyê û Prensîbên wê**

Çawa ku di destpêkê de jî amaje pê hatibû kirin, helbestvanên Malbata Aqtepeyê taybetiyên ekolekê yekser di xwe de dihewînin. Lewra li Aqtepeyê pênc helbestvanên ku xwediyê hin prensîbên hevbeş û xweser in kom bûne û vê komê bi van prensîbên xwe di nav tevahiya nûnerên edebiyata Kurdî ya klasîk de xweseriyek bi dest xistiye. Bi rehetî dikare bê gotin ku di tarîxa edebiyata Kurdî de komeke dî ya ku ev prensîb bi awayekî zelal û vekirî di xwe de civandibin tuneye.



Şêx Mihemed Kerbela

Prensîbên xweser ên ku Ekola Aqtepeyê ji helbestvanên dî yên klasîk vediqetînin sê heb in: Kurdîtî, Elewîtî û Neqşebendîtî. Herçiqas ev her sê prensîb li cem hemû endamên vê ekolê tên dîtin jî nûnerê ewil ên vê hizrê Şêx Ebdurehman e. Şêx Ebdurehman hem ji aliyê kronolojiya tarîxî ve, hem jî ji aliyê temsîla vê hizrê ve kevintir e û yên dîtir li pey şopa wî çûne û hizrên wî parve kirine. Ji ber vê yekê jî payeya damezirîneriya vê ekolê di destê Şêx Ebdurehman de ye. Li jêrê em dê di çarçoveya îfadeyan wan bi xwe de li ser van prensîban rawestin:

**1. Kurdîtî**

Kurdîtî, yan jî bi awayekî vekirî hizra neteweyî ya Kurdî prensîbeke girîng a Ekola Aqtepeyê ye. Hem ji îfadeyên Şêx Ebdurehman hem jî ji yên endamên dîtir ên Ekola Aqtepeyê bi zelalî tê fêmkirin ku hizra Kurdî ya Ekola Aqtepeyê di bin bandora Ehmedê Xanî de dirûv girtiye. Ji îfadeyê wareste ye ku eger ev hizra Kurdî tunebûya kulliyata edebiyata Kurdî ya Ekola Aqtepeyê jî dê derneketiba meydanê. Li jêrê li ser hizrên endamên Ekola Aqtepeyê yên di warê Kurdîtiyê de ji berhemên wan çend nimûne dê bên pêşkêşkirin.

Ji Benda Sebebê Telîfê ya *Rewdu'n-Ne'îm*a Şêx Ebdurehman:

*Ji Kurmanciyê zêde şîrîn niye*
*Welîkîn xerîdarê çendîn niye*

*Me kêşa eziyyet evan çend(i) rûz*
*Ji Kurdî kîtabek bi saz û bi sûz*

*Ku da Tirk û Faris nebêjin tu car*
*Nebûn Kurd ê nîşanê 'işqa xedar*

*Welîkîn te'essub nemaye li me*
*Ji vê Turk û Faris cimaye li me*

Ji Benda Sebebê Telîfê ya Leyla û Mecnûna Şêx Mihemed Can:

*Tirkî hene nîne Kurdewarî*
*Kurdî wekî kenzeke veşarî*

*Peyda bikira ger me emîrek*
*Sahibhuner û xwedanê şîrek*

*Ev Turk û Ereb Tetar û Faris*
*Carek bibûna li ber me naqis*

*Emma ku xwedan ji bo me nîne*
*Nêv Rûm û Ereb ne ademî ne*

*Her mêrê di wan de ejdiya ye*
*Nêv Rûm û Ereb wekî çiya ye*

Ji Destpêka Dîwana Şêx Mihemed Kerbelayî:
*Ger çî Ereb e, Tirk e, şahê Ecem e emma*
*Zanim ku bi Kurdmancî sikka xwe li şi're da*

Şêx Mihemed Kerbelayî di warê zimanê Kurdî de ferhengeke menzûm (*Mirsadu'l-Etfal*) nivîsiye û di vî warî de şopgeriya xwe ya Ehmedê Xanî weha aniyê zimên:
*Me her wek Newbihara Şêxê Xanî*
*Esasê wê ji bo etfala danî*

Şêx Eskerî jî di mesnewiya xwe ya bi navê *Iqdê Durfam* de hizra xwe ya neteweyî weha aniye zimên:
*Gelek şêrîn e ev ezmanê Kurda*
*Derîxa me ji dest yekcarî berda*

*Pesin dîde nîne Kurmancî ye saf*
*Xuya ye ne huner tev gotin û laf*

Şêx Eskerî derheqê Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Leyla û Mecnûna Şêx Mihemed Can de du heb medhiye nivîsîne û di van medhiyeyan de jî hizra xwe ya Kurdîtiyê îfade kiriye:

Ji Medhiyeya Mem û Zînê:
*Bilxasse bi nezmê Kurdîwarî*
*Qet kes nekirî meraq û yarî*

*Bilcumle kitab û şi´rê Kurdan*
*Bê qedri dibûn li cumle erdan*

Ji Medhiyeya Leyla û Mecnûnê:
*El-Heq gelek şîrîneda ye*
*Kurmancî ye zêdetir seza ye*

**2. Elewîtî**

Ji prensîbên sereke yên Ekola Aqtepeyê ya duyem hizra Elewîtiyê ye. Herçiqas civaka ku Ekola Aqtepeyê jiyana xwe tê de bûrandine ne Elewî ne jî, li cem endamên Ekola Aqtepeyê bi xwe hemû hêmanên Elewîtiyê yên sereke tên dîtin. Herçiqas di nav çanda Sunniyan de muhebbeta Cenabê Pêxember û ehlê beyta wî dustûreke girîng jî be, lêbelê Elewîtiya Ekola Aqtepeyê ji vê yekê gelekî pêşdetir e. Dikare bê gotin motîfên bingehîn ên Elewîtiyê bi tevahî li cem vê ekolê tên dîtin. Muhebbeta Îmam Elî û duwazdeh îmaman, nivîsîna mersiyeyên li ser bûyera Kerbelayê, le'netanîna li ser Yezîd, meha Muherremê, Aşûra, Meşhed û Qenber hin motîfên Elewîtiyê ne ku ev motîf tev li cem endamên vê ekolê jî hatine bikaranîn. Herweha nîşaneyeke dî ya vê hizrê jî ew e ku damezirînerê Ekola Aqtepeyê Şêx Ebdurehman, navên herdu kurên xwe Kerbela û Eskerî ku ew jî endamên vê ekolê ne, di çarçoveya çanda Elewîtiyê de danîne. Lewra Kerbela, bûyera Kerbelayê û Eskerî jî motîfa duwazdeh îmaman îfade dike.


Şêx Ebdurrehman

Bi qeneeta me ev derba bihêz a li ser motîfên Elewîtiyê bi du faktoran dikare bê îzahkirin. Ya yekem aliyê wan ê tesewifî ye. Lewra di tradîsyona Sunniyan de, xeta Elewîtiyê ji aliyê mutesewifan ve tê temsîlkirin. Ya duyem jî bandora Ehmedê Xanî ye. Lewra Xanî, di *Nûbihara Biçûkan* de li kêleka navên çar xelîfeyan cih daye navên 12 îmaman jî û xwestiye ku zarokên Kurdan fêrî van navan bibin. Çawa ku Xanî di hizra neteweyî de bandor li endamên Ekola Aqtepeyê kiriye, bi heman rengî di vê mijarê de jî bandor li wan kiriye.

Dema em li berhemên edebî yên helbestvanên vê ekolê dinêrin, em dibînin ku ji aliyê wan ve derheqê Elewîtiyê de yekuneke mezin helbest hatine nivîsîn. Li jêrê ji helbestên wan ên di vî warî dê çend nimûne dê bên pêşkêşkirin:

**Ji Mersiyeya Hesen û Huseyn a Şêx Ebdurehman:**

*Di sehrayê kerb û bela Şeh Huseyn*
*Dehen xuşk û lebteşne bû Şeh Huseyn*

*Hewar e werin ma'temê bî't-temam*
*Ji bo mersiya Şeh bikin îhtîram*

*Muherrem dema taze bêtin hîlal*
*Cedîden bikin ma'temê pur delal*

*Çu 'aşûra bêtin di mahê hezîn*
*Dikin heft tebeq erd û esman enîn*

*Huseyna Huseyna Şehê Kerbela*
*Bi 'eşqa te, xayet ez im mubtela*

*Çi agir kete cergê min pir şedîd*
*Huseyn û Hesen herdu bûne şehîd*

*Ji destê me naê bikim xizmetê*
*Welê ser Yezîdî dikim le'netê*

**Ji Recmiye/Lenetnameya Şêx Ebdurehman:**

*Sed hezar le'net muzaef şubhê baranê şedîd*
*Her zeman la yenqeti' bin ew li ser Rûhê Yezîd*

*El-'eteşgûyanê deşta Kerbela tên fikra min*
*Her zeman le'net dixwînm ez li ser canê pelîd*

*Derdê min dûr û diraz e naêtin hedd û hîsab*
*Lew evê recmiyeê înşad dikim hinde medîd*

*Rûhiya wirdê zeban bêje hemî şam û seher*
*Le'netullahî ela rûhi'l Yezîdî fi'l-mezîd*

**Ji Medhiyeya Îmam 'Elî ya Şêx Ebdurehman:**

*Ya Eliyya ya Eliyya ya Eliyya ya Elî*
*Şod zi tîxî ab(i)dared rûyê 'alem muncelî*
*Geştî goştî serteser ez wesfê paket mumtelî*
*La feta îlla Elî la seyfe îlla zulfîqar*

**Ji Mersiyeya bi redîfa "Xakê Kerbela" ya Şêx Kerbela:**

*Der muherem her sene dar û ber û ax û nebat*
*Xwûn dibarînin ev e nîşanê xakê Kerbela*



Şêx Mihemmed Can

*Sed hezar l'enet dibêjin ser Yezîd û tabi'an*
*Behrê wan mezlûmê meqtûlanê xakê Kerbela*

**Ji Medhiyeya 'Eliyyê Esxer a Şêx Kerbela:**

*Tûleê gerden bi zencîrê 'Eliyyê Esxer im*
*Lew li ser emsal û aqranan reîs û serwer im*
*Tewq(i) der gerden serê zencîrê der destê te bit*
*Rû bi xakê pakê Meşhed ser li ber pê ez werim*

*Ger bi şefqet çav bidî tolê xwe ey mewlayê min*
*'Ebdê alê Mustafa ez Kerbelaî Qember im*

**Ji Medhiyeya 'Eliyyê Esxer ya Şêx 'Eskerî:**

*Tûleê gerden bi zencîrê Eliyyê Esker im*
*Ustuxwanxwarê derê cûd û sexayê rehber im*
*Ew Yezîdê kafirê mel'ûnê metrûdê le'în*
*Sed hezar le'net li wî hem wan hevalê bêşerim*

**Ji Şefaetnameya Şêx 'Eskerî:**

*Ez im kelbê şehzadeganê nebî*
*Ku bû darê rehmet ji wan meywebar*

*Ku ya Rebbî hêvî rica Eskerî*
*Bide xatirê ehlê beyta kubar*

**Ji Şêx Hesîb:**

*Peyrewê Rûhî me ender menhec û resm û terîq*
*Sed hezaran sed hezar car le'neta Heq ser Yezîd*

*Serxweş e Hesbî yû sermest e qelem der guftugo*
*Werne der dîwan netîna ismê wî kelbê pelîd*

**3. Neqşebendîtî**

Ji prensîbên bingehîn ên Ekola Aqtepeyê ya sêyem hizra Neqşebendîtiyê ye. Neqşebendîtî terîqeteke tesewifî ye û bi taybetî di du sedsalên dawî de bi riya Mewlana Xalidê Şarezorî (k.d.1826) li Kurdistanê gelekî belav bûye. Çawa ku di beşa Paşxana Ekola Aqtepeyê ya vê nivîsê de jî hat îzahkirin, endamên Ekola Aqtepeyê jî nûnerên vê terîqetê ne û li Dergahê Aqtepeyê bi rêzê postnişînî kirine. Lêbelê wan bi vê pratîka tesewifî qîm neanîne û di berhemên xwe de jî aliyê xwe yê tesewifî derxistine pêş. Damezirînerê Ekola Aqtepeyê Şêx Ebdurehman, di destpêka *Rewdu'n-Ne'îm*ê de ev yek bi zelalî îfade kiriye:

*Li ser î'tîqada Îmam Eş'erî*
*Terîqet bizan Neqşiyê Xalidî*

*Kemerbendê seccadeê Neqşiyan*
*Ji xizmetguzaranê wan ewliyan*

Şêx Ebdurehman herweha di dîwana xwe de li ser Şahê Neqşebend du medhiye nivîsîne ku bendên wan ê ewil weha ne:

*Peyrewê dermandeem rû ber hudayê Neqşîbend*
*Dest(i) der damanê pakê bê riyayê Neqşîbend*
*Şehriyar im zankî ustad em gedayê Neqşîbend*
*Tûtiyayê dîdesaz im xakêpayê Neqşîbend*
*Tabiya bim sirrê Heq ez feyzê Şahê Neqşîbend*
---


Şêx Hesîb Aqtepî

*Kelbê şahê Neqşibend im ta li dinya zinde me*
*Me'dena cûd û sexaê ez feqîr im hewce me*
*Der sulûkê rahê Heq ez murxekî perbeste me*
*Bêhişa xemra gunah im asî û şermende me*
*El-Eman şahê mezin yexsîrê zincîra te me*
*Sed meded pîrê terîqet kelbê dergahê te me*

Şêx Eskerî helbesteke Mewlana Xalidê Şarezorî ku derheqê silsileya Neqşebendiyan de hatiye nivîsîn, di Keşkûla xwe de bi cih kiriye û wî bi xwe jî li dawiya vê helbestê sê beyt zêde kirine. Şêx Eskerî di van beytan de ji Mewlana Xalid heta bi apê xwe Şêx Mihemed Can cih daye navên şêxên silsileya Neqşebendîtiya Xalidî ku ew jî ev in: Şêx Xalidê Cizîrî, Şêx Salihê Sîpkî, Şêx Hesenê Nûranî û Şêx Mihemed Can.

Şêx Eskerî di medhiyeya Leyla û Mecnûna Şêx Mihemed Can de jî ew wekî pîrê terîqê bi nav kiriye:

*Ew pîrê terîqê Şêx Mihemed*
*Can e Xudê lê ke rehmê bê hed*

Şêx Eskerî di mersiyeya xwe ya li ser Şêx Mihemed Can de jî weha behsa Neqşebendîtiyê kiriye:

*Tûtiyayê dîde min xakê derê şahê mezin*
*Neqşibendê qelb û dil ew bo gunahan mehderim*

Şêx Hesîb jî di rê û rêbaz û terîqetê de xwe wekî peyrewê apê xwe Şêx Ebdurehman dide nasandin:

*Peyrewê Rûhî me ender menhec û resm û terîq*
*Sed hezaran sed hezar car le'neta Heq ser Yezîd*

**Encam**

Çawa ku tê dîtin Kurdîtî, Elewîtî û Neqşebendîtî sê prensîb in ku ji aliyê hemû endamên Ekola Aqtepeyê ve hatine qebûlkirin. Bi rastî ev her sê prensîb berî Ekola Aqtepeyê jî bi pileyên ciyawaz di edebiyata Kurdî ya klasîk de hatine temsîlkirin û wekî hizrên sereke yên çanda Kurdî ya klasîk jî dikarin bên dîtin. Bo nimûne li cem Ehmedê Xanî hizra Kurdîtiye serdest e, li cem Melayê Cizîrî çend motîfên Elewîtiyê bi awayekî lawaz tên dîtin, yan jî li cem gelek helbestvanên Qadirî û Neqşebendî sitayîşên van terîqetan hatine kirin. Lêbelê digel vê jî tu caran temsîla van her sê prensîban bi hev re, ji aliyê komekê ve û di asteke bilind de nehatiye kirin. Ekola Aqtepeyê di vî warî de yegane ye û loma jî wekî ekoleke ku hizra Kurdî ya klasîk bi tevahî di xwe de civandiye, pêşxistiye û sîstematîze kiriye dikare bê dîtin.